

folklorame

Zargotin pişt e, folklor her tişt e! Hejmara 6. | Hezîran • Tîrmeh • Tebax 2020

Biha: 15 ₪

Cotkarî (Helbesta gelêrî),
Mihemed Selîm Bedirxan
Lavijê Pîr (Ji arşîva 'Ebdureqîb Yûsifî),
Hêmin Omar Ahmad
Riştêrûn, Jîyan Ozkan&Rojda Ozkan
Bavo Bavo, Eşref Keydanî

Govend, kinc û xemila Efrînê, Şoreş Reşî
Helîma Hesên Axa, Nîhat Oner
Kêynaya padîşay û tembelê Baxdadî,
Yakup Taşçi
Mîkrotoponîma gundê Fêrgayê
(Silopya-Şernex), Egîdê Fêro

Hejmara 6. | Hezîran, Tîrmeh, Tebax 2020

Ferhat Arslan

WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ



MEZOPOTAMYAYÊ

WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ



Dadê Hecî Fîdan Gonder, (1940 -)

Dadê Hecî Fîdan Gonder, ji gundê Hirîtê, navçeya Hîzana Bedlîsê ye. Dadê, bi karê me hesîyaye û wê jî dest bi strînî kiriye. Bi xêra nevîyê wê Egîdî, vîdeoyên wê gihîştin ber destê me. Dadê mala te û nevîyê te hezar carî ava be. Heta zarbêjên mîna te û xemxurên mîna nevîyê te hebin, dê karê me berdewam be. Xweda, te û yên mîna te jî serê me kêm neke.

folklorame



folklorame

Mihemed Kerîm Şerîf (1946-2002) li gundê Gayincê ku girêdayî bajarê Hewlêrê ye ji dayik bûye. Sala 1969an bûye mamosteyê dibistanê. Li ser folklorê kurdî 5 pirtûk weşandine.

Berhemên wî berhevkarî û lêkolîn in. Berhemên wî ev in:

- 1- Folklorî yariyekanî kurdewarî (1971)
- 2- Folklorî honrawekanî kurdewarî (1974)
- 3- Siwarçakî le lawikî kurdewarî (1978)
- 4- Heqayetî kurdewarî (1985)
- 5- Meselekanî kurdewarî (2005)



 Refik Tekin

folklorame

f



SPAS JI BO
ALÛKARÎYA WAN
Aydin Batur
Beroj Mukrîyanî
Bîlal Guldem
Dûrzan Cîrano
Egîd Gonder
Eşref Bolumcu
Ferhat Arslan
Hogîr Ar
Mazlûm Sîyabend
Mûrat Adiyaman
Nûrulah Tekîn
Orhan Tanhan
Refik Tekîn
Rojda Ozkan
Saner Şen
Selmet Guler
Ugur Sermîyan

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com

folklorame

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsîyar e.

Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 2

Hejmar: 6

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafîk: Sevînc Adiyaman

Fotoyê bergê pêş: Mûrat Adiyaman

Fotoyê bergê paş: Ferhat Arslan

Navnîşan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađluk ve Kûltûr Vakfı

İktisadi İşletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. Şti.

Orta Mah.Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919



Pirtûka pêşnîyazkirî

Navê pirtûkê: Baqek ji folklora Berîya Mêrdînê

Nivîskar: Mistefa Aslan

Weşanxane: Wardoz



BAQEK JI FOLKLORA BERÎYA MÊRDÎNÊ

Kurte

Herêma Mêrdînê, yek ji kanên zengîn a folklora kurdan e. Di vê pirtûkê da, gelek pêkenok, çîrok, serpêhatî û fablên Berîya Mêrdînê hene. Ev hêmanên zargotîne, gelek jê li ser zaran, li odeyan bûne mêvan û heta roja me hatine.

“Mele diçê ser mûlidê. Yekî gundî ba dikê melê dibê: “Seyda îşev were ser mûlida me.” Mele zarokê xwe tev de didê dû xwe û diçê. Yê gundî li devê derî dibîne go mele zarokê xwe tev de anîne. Jê re dibê: “Mele mi go tu wer ser mûlidê, mi nego zarokê xwe jî werê.” Mele dibê: “Xwedê mala te ava bike, ez sale weqat wa xwedî dikim, ma go tu şîvikê bidê wa, wê dinya xera bibê!?”

Naverok

- 5 Ji edîtorî
6. Cotkarî (Helbesta gelêrî), **Mihemed Selîm Bedirxan**
14. Dermanê ehmaqan tune yi, **Hatîce Aktay&Helbest Çetîn**
17. Ker di zargotinê da, **Bahoz Baran**
23. Ferhenga tematîk ya cotkarî û ajeldarîyê (Bajarê Agirîyê), **Fatma Şahîn**
32. Mamikên Qerejdaxê-2, **Mehpûs Serhedî**
34. Lavijê Pîr (Ji arşîva ‘Ebdureqîb Yûsifi), **Hêmin Omar Ahmad**
38. Çîrokên biwêjan-3, **Asmîn Ūyanik**
40. Meseleya mele, **Elîf Gunduz**
41. Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
42. Rişterûn, **Jîyan Ozkan&Rojda Ozkan**
46. Motîfên Çîroka Leyl û Mecrûmê, **Feray Olçer**
55. Bavo Bavo, **Eşref Keydanî**
58. Nêçîrvan û karxezal, **Nasir Torî**
60. Govend, kinc û xemila Efrînê, **Şoreş Reşî**
64. Gebolî, **Perîhan Kaya**
66. Qewlêrkên Tizyanê, **Mem Mukrîyanî**
69. Gûlik (Li Pasûrê pincareka biekî û şîfadar), **Ayela Zarto**
73. Helîma Hesên Axa, **Nîhat Oner**
78. Keleya Dimdimê, **Arxa Makûyî**
81. Sî Ahmedê Silivî û Xecê, **Sosina Farqînê**
84. Kêynaya padîşay û tembelê Baxdadî, **Yakup Taşçi**
88. Diayên Meletî û Mereşê yên bi navê Xwedayî, **Mahîr Ugur**
93. Mîkrotoponîma gundê Fêrgayê (Silopya-Şernex), **Egîdê Fêro**

Ji edîtorî

Gelî canik û camêran, eva cara şeşê ye ku em digihîjin meqsed û mirada dilê xwe. Folklorî Me û we îcar jî qeyd û bendên xwe şikandin û xwe ji çîya û banîyan berda di rê û rêbaran ra xwe gîhand we.

Ji ber tirs û xofa nexweşîya koronayê helbet gelek zor û zehmetî me dîtin di pêvajoya amadekirina vê hejmarê da. Lê evîn û hezkirina folklorê, alîkarî û piştevanîya nivîskar û fotokêşan û xîreta desteya weşanê, kir ku rêya zor û zehmet li ber me bibe rêya bax û gulistanan. Bi kêf û eşq û dilxweşî, me hejmara xwe ya şeşê amade kir. Hêvîdar im bi dilê we be.

Di vê hejmarê da bi giştî bîst û sê nivîs hene. Ji van bîst û sê nivîsan du jê bi zaravayê kirmanckî ne, bîst û yek jî bi kurmancî ne. Her bîst û sê nivîs jî bi alfabe ya latînî ne. Ji van bîst û sê nivîsan yek xebateka arşîvê ye. Folklornasê kurd Ebdulreqîb Yûsîfî îsal arşîva xwe neqilî ser înternetê kir û bi hezaran rûpelên folklorîk li benda mereqdar û lêkolînerên folklorê ye. Bi xêra hêja Hêmin Omar Ahmad, haya me jê çêbû. Hêja Hêmin ji bo giringî û balkişîndina vê arşîvê berhevdana Mela Xelefê Bafeyî -Mela Xelef li ser daxwaza Ebdulreqîb Yûsîfî bi salan li nava kurdên bakûrî berhevkarî kirîye- latînîze kir. Ev arşîv îro roj ji her kesî ra vekirîye, heçî kesê bixwaze dikare sûtê jê bigire.

Di nivîsa xwe ya kirmanckî da Perîhan Kayayê qala xwarina “gebolî”yê kirîye û berhevkarê Sêwregî Yakup Taşçiyî jî çîrokek (estaneke) ji dapîra xwe qeyd kirîye û pêşkeşî we hêjayan kirîye. Ji Herêma Torê, Nasir Torî bi meselokekê; ji Farqînê, Sosîna Farqînê bi çîroka Sî Ahmedê Silîvî û Xecê; ji Şemzînanê Jîyan û Rojdayê bi xwarina “rişterûn”ê; ji Pasûrê Ayela Zartoyê bi lêkolîneka li ser pincara gûlikê; Ji Agirîyê Fatma Şahîne bi ferhenga tematîk ya ajeldarî û cotkarîyê navê xwe xist nava listeya nivîskarên Folklorî Me. Rêya wan vekirî pênûsa wan her tim xurt be.

Şoreş Reşî, Nîhat Oner û Arxa Makûyî ketine nava rûpelên dîrokê û toz û gemara li ser bûyer û geşedanan xepartine. Yekî, berê xwe daye bûka welatê me Efrînê, yekî berê xwe daye Deştê Rewanê û li ber çemê Erezê konê xwe vedaye, yekî jî berê xwe daye warê Emirxanê Lepzêrîn Urmîyeyê.

Mîhemed Selîm Bedirxan bi salan e ketîye pey helbesteka gelêrî ya qetqetî. Di nivîsa xwe da wî hem qala serhatîya xwe û peydakirina van varyantan kirîye û hem jî di dawîyê da parçeyên qetqetî kirine yek û helbesteka gelêrî tanzîm kirîye. Feray Olçerê berê xwe daye motîfên çîrokekê û Bahoz Baranî jî qala motîfa kerê kirîye di nivîsa xwe da.

Egîdê Fêro, li ser meseleyeka giring -toponomî- gotareka hêja û bikeys nivîsîye. Wî berê xwe daye Fêrgaya Silopyayê, ji kal û pîran navê kanî, gol, gerav, çem, mil, zevî, cîm, pal, şikeft, rê, rêbar, dehl, teht û zinaran pirsîye û wî ew li gor zanista toponomîyê senifandine. Lazim e ku her kurdek vê gotarê bixwîne û her kes toponomîya warê xwe amade bike.

Bi hêvîya hejmarek din; korona dûrî we be, folklor nêzîkî we.

Eşref Keydanî





Go:

“Wele qral gotîyi bira bi-
zewici ji xwe’r û wê îşê wê
jî rast weri. Pîrek i, kes bi
qewlê wê naki.”

“Ê, go hema wer min mar ki
(jinikê jê’r go) û tu yê bibi
walîyê vira û ez jî pîreka
te bim û em ji xwe ra kêf
bikin.” (Wek em bên walîyê
Diyarbekirê.)

Dibê:

“Na babo, Xwedê bidi min.”
Jinikê ra dibê, qral gotîyê
Xwedê teala wê bidi te.

Dermanê

ehmaqan tune yi



Zarbêj Gulo Çaliş



Pir feqîr bû, pir belengaz bû, gedekê wî birçî bûn. Go, “ez herim cem qral, ma tişkî bêji bira ji min ra, wele gedê min mirin ji birçîna, e tişkî becer nakim.” Çû cem qral. Na, çû bi rê de. Mêze kir gurkî hat pêşîyê, gur giş aha yara bere¹ yi, kurm ketinêê. [Gur] dibê:

“Birako, deri ku?”

[Mêrik] dibê:

“Welê ez herim cem qral derdê xwe bêjim, halê min besî min i, gedê min giş ji birçîna dimirin.”

“Law dibê derdê min jî bêje birê min, ez bi qurbana te bim, ma canê min ewk bûni îsal çend sal i rehet nabi, ez ê çî derman lê bidim, bira dermankî ji min ra bêji.”

[Gur] go:

“Birayê min, ez ê bêjim, tu îşê min jê xera nabi, tişkî nabi, ez ê bêjim.”

Çû mêze kir sê heb xort li wira tenê² xwe diçînin û ew jî lêva wan şindiriyi, dirêj bûyi.

[Mêrik] dibê:

“Birako, ma derdê we çî yi, law hûn sê heb?”

1 yara bere: tevda birin e, birindar e.
2 tene: genim.

“Ma derdê me çî yi, dibê tenê me, em her sal dajon orta³ wî şin nayê û dora wî tenê şin tê, em tişkî jê hilnaynin. Dibê qe tu çû cem qral jê ra bibê, hela bê çî derdê wê heyi?”

[Mêrik] dibê:

“Bira, ez ê jê ra bêjim, ma çima nebêm.”⁴

Ew jî çû. Deri mêze diki çen hew⁵ siwarê hespa; hespên wan boz in, spî ni, tu qêmîş naki. Şîrşîrê hespê wan i, li devê rê sekinîni. Dibê:

“Birako, deri ku?”

[Mêrik] dibê:

“Welê e diherim cem qral, ma halê min awanî yi, ez ê herim derdê xwe jê ra bêm.”⁶

[Jinik] dibê:

“Lawo, derdê min jî jê ra bê,⁷ ez jî walî mi û kes bi xebera min naki.”

“Ê dibê ez ê, ê te jî bêm xwakê.”

Radibê deri, deri cem qral, ê gur dibê.

Qral dibê:

“Law bira xwîna yekî ehmaq bi canê xwe

3 orta: nav, naverast.

4 nebêm: nebêjim.

5 çen hew: çend heb.

6 bêm: bibêjim.

7 bê: bibêje.

Mamikên Qerejdaxê 2



Mehpûs Serhedî

1- Tapî tapî minarek i,
Hazar tapî tê da yi?

2- Bixçakî çek i,
Xêncî gede kes nikani veki?

3- Gora pîrê kûrîn i,
Ne avê dikşîni
Ne çamûrê dikşîni?

4- Congê nêr,
Li gîhêr?

5- Topik mi heyi,
Heft qulkê wê heni?

6- Dêla xwu bilin diki,
Bişkula davê?

7- Ne tel i ne tirş i,

Ne şor i, ne şîrîn i,
Wer jî xweş i?

8- Ser kurkirî,
Bin kurkirî,
Di binê cîya¹ te ra kirî?

9- Dizê malê,
Li nav kayê?

10- Çû kanîyê,
Da penîyê?

11- Serî heyi,
Dawî tune yi?

12- Gûyê wî helawa bavê te,
Vijka wî li devê cîya te?

1 cî: dê/dayik.

13- Şiklê konkî da yi,
Cîyê wî tuni, di qûnkî da yi?

14- Singik kayê da,
Singik destê dayê da?

15- Du dar in, meqesik i?

16- Seryak² i,
Bîst serîya datîni?

17- Ser wî derd i,
Binî derman i?

18- Ava kewzê,
Tê dizê?

2 seryak: serîyek.

19- Taca çê yi li serî,
Ne zewicîyi,
Çel gede wê heyi?

20- Çevê wî tas,
Tilya wî asas,
Çar metre jê ra nabi kiras?

21- Înt diki gû tuni,
Iyar diki mû tuni?

22- Tişkî mi heyi
Sipî yi, çi yi?

23- Kalkê rûkurkirî,
Xwu di bin cîya te ra kirî?



Ferhat Arslan



Rojda Ozkan

Bersiv

1. Bêjing 2. Zaroka di zikê dayîkê da 3. Gîzme 4. Kêran
5. Serî 6. Sîleh 7. Av 8. Kulav 9. Mişk 10. Por 11. Derew 12. Rûnê
meşkê 13. Kûvark 14. Melêb 15. Du dar: her du nigên leylegê,
meqes: nukilê leylegê 16. Mela 17. Kereng 18. Zebeş 19. Hinar
20. Deve (Hêştir) 21. Qijnak 22. Sipîyên serîyan 23. Misîn

Lavijê Pîr (Ji arşîva 'Ebdureqîb Yûsifî)*



Ebdureqîb Yûsif

Latînîkirin, ferheng û nîşe:

Hêmin Omar Ahmad ►

Şagirdê min Mela Xelefê Bafeyî¹ şehsiwarê kelepûra kurdî di Kurdistana Bakur da li ser daxwazîya min, zanyarîyekî gelek baş xirve kirîye derbara Lavijê Pîr da. Nivîsîye:

Lavij xelkê gundê Nîrmanê bûye, ku dikeve Rojhilatê Cizîrê li dešta Silopî. Navê wî yê eslî nehatîye zanîn. Lavij di sedsala hejdebê da bûye û paşî mirina Mehmed Begê Şeref Begê mîrê Botan di sala 1792an da her sax bû, lê em nizanin çend salan paşî wê salê maye.

Lavijê Pîr, stranbêjê Mehmed Beg bûye, wek Miradê Mêremê yê Xursî, lê li Botan stranbêj ji Lavij mezintir nebûne û heta îro nav û bangê wî maye û hindek ji wan stranên çêkirine mane.

¹ Mela Xelef (-1993) şagirdê Seyda 'Ebdureqîb Yûsifî bûye û di navbera salên 1970-1990î da gelek keresteyên folklorê xirve kirine û bi çend defteran ji seydayê xwe ra şandine bajarê Silêmaniyê.

* 'Ebdureqîb Yûsif, dirokên û şûnwarnasê kurdan e. Niha temenê wî 80 sal e û 60 sal in xizmeta folklor û dirok û şûnwarê Kurdistanê dike. Îsal piranî arşîva xwe xist ser malpera înternetê û ta niha bi mezin-tirîn malpera şexsî tê hejmartin.

Lavij, şayer bûye; yanî şa'irekê kurdewarî bûye û bi xwe stran honandine, wek 'Evdalê Zeynê û 'Elî Berdeşanî² û Ehmed Kamusekî³ û Hesen Zîrek.⁴

Hindek stranên wî şî'rekî tamam e. Di wezin û qafiyê da peyvên wî nazik in û me'na wan jî nazik in, wek strana "Şevê Çîrya Dirêj in" ku ji nişkê ve çekirîye û gotîye di dîwanxana Mehmed Beg da, heta tê da 'uzra xwe ji Mehmed Beg bixazê, ku roja pêştir rêkirbû pey wî û nehatibû û heta amaje bike bo wê karesata bi serê wî hatî ku kurê xwe Seydikê nêçîrvan bi xeletî kuştîye û termê li çîyayê maye:

Lavij got:
Şevê çîrya dirêj in
Xewka dilê me nayê
Bist û pêwir tavêjin
Qurx hatîye lîqayê
Birînên kul ji mêjin
Kew û deman lê nayê
Kurrê Lavij nesax e
Nehêlin li ber sermayê

Lavij got:
Şevê çîrya dirêj in
Xewka dilê me nayê
Bist û pêwir tavêjin
Qurx hatîye lîqayê
Birînên kul ji mêjin
Kew û deman lê nayê
Kurrê Lavij nesax e
Nehêlin li ber sermayê

Strana Lavij li ser termê Seydikê nêçîrvan ku di çaxê nêçîrê da be xeletî tifeng lê dabû û kuştibû li Çîyayê Dêra, li bakûra Cizîrê. Ev stran jî şî'rekî rewan e.

Ev stranên heta niho bi navê Lavij vemane:

1- Strana Seydikê Nêçîrvan ku gehîştîye Herêma Mukrî li Kurdistanana Rojhilat û gehîştîye Silêmanîyê li Kurdistanana Başûr her wek deqa wî bi soranî, nivîsevan Ceza 'Elî Emîn belav kirye, bi navnîşanî Seydewan ve.

2- Strana Nêrîyê 'Efnu û Hejal.⁵

3- Şevê Çîrya Dirêj in.

4- Ew çerka⁶ gotîye wextê di gel gelek ji xelkê Cizîrê çûne li ser fermana

2 'Elî Berdeşanî (1767-1809) helbestvanekî soran bûye û berê peydabûna helbesta klasîka ya soran, helbest bi şikila gelêrî nivîsiye.

3 Ehmed Kamusekî, xelkê gundê Kamusekê ye. Kamusek girêdayî Şeqlaweya Hewlêrê ye. Ehmed Kamusekî helbestvanekî gelêrî bûye û ji bo cara yekem di sala 1980yî da 'Ebdureqîb Yûsîfî derbarê wî da gotarek nivîsiye.

4 Hesen Zîrek (1921-1972) stranbêjekî xelkê Bokana Kurdistanana Rojhilatê ye û piraniya stranên xwe, wî bi xwe hûnane.

5 Mehmed Beg, nêçîrvanekî binavûdeng bû; çar hizar pezê kuvî kuştibû, lê dû nêrîyên gelek men hebûn, gelek hez ji wan dikir, nedikuştin û qedexê kiribû kes wan bikuje, yek navî wî kiribûn nêrîyê 'Efnu û yek jî navê wî kiribûn Hejal. Mehmed Beg, wesiyyet kiribû paşî mirina wî kes wan nekuje, lê paşî mirina wî Mala Bego ku bavkeyekî xurt bû li Cizîrê ew kuştin û ji ber vê yekê Mala Zeydîn ku ew jî bavkeyekî xurt bû li Cizîrê şer di gel Mala Bego kirin û paşî ku pitir ji sed zilam ji Mala Bego hatin kuştin, şikestin di şer da. Mela Xelefê nemir, bi dirêjî serhatîya nêrîyê 'Efnu û Hejal nivîsiye, bi dirêjî di deftera 8an da. Mirê Botan Mehmed Beg ku 49 sal hûkim kirîye û ji hemî mirên Botan pitir nav maye. Mirê Botan Mehmed Beg du tebî'etê ji hev cuda hebûn, yek ew bû ku tebî'etekî nazikî şa'irane hebû, hez ji jîngeya Kurdistanê dikir û pitir her li çîya dima û nêçîr dikir, nişançî bû. Lavij, wî bi şêxê nêçîrvan wesif kirîye. Wî nêçîrvanên xwe hebûn û hez ji stran û stranbêjan dikir. Tebî'etê duyê ew bû ku zalim bû, gelek serhatî û hîkayet û stran diçûn ser wî.

6 Mela Xelef nivîsiye; çêrik, bi straneka kurt tete gotin.



Berhevkar
Mela Xelefê Bafeyî

Qewlêrkên Tizyanê

Mem Mukrîyanî



1-

Xanîkê bavê te bi kort¹ a
Van dilopa şorteşort a²
Xwaka'm megrî zave xort a.

2-

Xwakê xanîkê bavê te sipî kir
Teyr û tilûra lê hêlîn kir
Xwaka'm zarok bû xerîbî kir.

3-

Ca³ bûkê dêlka sor a
Li devê derî kir kilor⁴ a
Nêle ku berbûk here jor a.

4-

Xwakê'b⁵ qarşî carê⁶ mala ketim
Mûm û fener l'me⁷ vêketin
Qirka bûka me tije zêrê zeynet in.⁸

5-

Xwakê def hatî van dîyara
Xumîn ketî van newala
Xwakê qe pêşya bûka me hezar û pêsed sûwar a

6-

Mihîna bûka me xerîb bû
Mihînê xwe neda nava sûwara
Bûka me meşîya şîreşîr⁹ û nalenala

7-

Xwakê çi dara gulîfirko
Tu daw û delingê qetnî hilko
Xwakê qe'j mala bava nabe milko



Zarbêj Hecî Fato Albayrak

1 kort: kortal, gewmik.

2 şorteşort: dipedip, tepetep, şîreşîr. Dengê dilopan.

3 ca: dê, dayik.

4 kilor: gilover, xelex.

5 xwakê'b: xwakê bi.

6 car: dîyar, gir, qot.

7 l'me: li me.

8 zeynet: zînet, xîşîr, xemil, neqîş.

9 şîreşîr: lîlandin.

Sî Ahmedê Silivî û Xecê

*Xecê dibîne wa gamboxe ser jê kirîye û Sî Ahmed
nexwîyaye. Gazî dike dibê:*

“Sî Ahmeddd, Sî Ahmedê Silivî!

Xweyê tîr û kevan î, ka tu di ku da yî?!”

*Dibihîze ku hima nelîna dengê Sî Ahmed tê ji zindanê. Sî
Ahmed dibê:*

*“Xecêêê, min bi te ye tu bi Xwedê ye, here çil qîzan kom
bike porê çil qîzan jê bike bîne bavêje zindanê”*

Sosina Farqînê



Ez ê ji te re behsa Sî Ahmed bikim, jê re dibêjin Sî Ahmedê Silîvî. Xecê qîza padîşah bûye o¹ Sî Ahmed jî yekî gurîlokî bûye, ber qesra mala Xecê de derbas dibe; çima dilê xwe nakê. Dilê xwe dixê qîza padîşah. Qîza padîşah jî dilê xwe dixê wî. Dilê wan dikeve hevdu, Xecê dibêje were min ji bavê min bixwaze belkî min bide te. Sî Ahmed radike sê heban diçin ber derîyê mîr, dibêjin ez hatime qîza te. Bavê wê dibê, “Rakin milê wî, wî bavêjin paşîya hespa o bi hespa va girê bidin o heta hesp bazdin bila wî ji hev perçe perçe bikin. Îja ez qîza xwe didime vîya?” Sî Ahmed dertê, dertê û diçe. Yekî qral tê Xecê, çawa tê o axa qîza xwe dide wî.

Qîza xwe dide yekî qral. Dilê Xecê jî ji Sî Ahmed ra heye, wê û Sî Ahmed bi hev re xerbar daye, gotîye ku ez terka te nadim. Qîza paşa diçe ber kuçikê agir. Ber xwelîya agir rûndinê, çar pênc heb kapan tîne, dixê nav xwelîya agir. Radike xwelîya agir li pey şopa xwe dirêje, kaxezek dixê nav xwelîya agir û diçe. Çi pir çi hindik evîya tê dibîne, qey zane ku vayê îro deweta wê ye, wê dibin. Sî Ahmed jî tê, dibîne ku wa wê birine. Diçe ber kuçik darikê xwe li hev dixê. Kaxezkî derdikeve, kaxez dinêre, dibêje, eee! Xecê di kaxez da gotîye, “Ger sebî bî wa min kapan danîye wir ji xwe

1 o: û. (gihanek)

re bi kapan bileyze o ku tu mêr î, ewk î were, were dûşa² min da. Wa ez dûşa xwe da diçim. Were tu yê min biqefêlî?”

Sî Ahmed jêhatî ye, Sî Ahmed hespê xwe digire, hespê wî agir ji devê wî dirije. Li hespê xwe suwar dibe, ha li vir û ha li wir. Eee, wa dibîne, li ser kanîkî ne tev peya bûne, nanê xwe dixwin. Tev li wê ne. Evîya diçe dikeve nav vî karwanî. Ha vir da ha wir da xwe digihîne Xecê. Diçe ber kêleka Xecê, Xecê çev wî dikeve kêfa wê pir tê. Dibê, “Ê wele wa tu hatî?” Vana gava radibin nanê xwe dixwin, li hespên xwe suwar dibin ku bi rê bikevin. O hima Sî Ahmed hespê xwe dide kêleka wê. Dewetvanîyek ji padîşah re dibêje, “Tu li wî suwarê dinêrî çiqas diçe xwe li kêleka bûkê dixê, li derdora bûkê ye.” Kurê padîşah dibêje, “Tiştî nabe, de dewet e, kêfa wan tê bira qet.” Sî Ahmed di kêleka Xecê de hima radike milê Xecê, dide pişt xwu û penîyê dide hespê xwe û direvîne.

Vana sê sed suwar dû dikevin, eyb e eybb... Wî diqefêlin ka? Li dû dikevin, kes nizane ku de çû. Dikeve nav Çîyayê Sîpanê Xelatê. Sîpanê Xelatê ku çîyayekî kûr e. Wê direvîne, diçe dikevin nav çîya û li wê derê dimînin. Kes li pey wan naçe, nizanin di ku da çûn. Sî Ahmed ret³ e, ji xwe re serê xwe datîne ser çoka Xecê o di xew da diçe. Xecê bi porê wî re dileyze. Carekî Xecê dibîne ku gambaxe⁴ wa hatin. Çar heb in, sê heb jê wekî boxeyan in yek jî kundirokê, gurîlokê biçûçik xwe daye pişt nêçîra xwe, nahêle ku her sêyên mezin ên din ber bi gamêşa wî herin. Xecê dikene dikene, wisa dixeriqe, dibêje vîya jî ewko ye eynû Sî Ahmed e. Sî Ahmed rakir min ji nava wan anî û revand. Kenên wê tê. Sî Ahmed şîyar dibe, dibêje:

“Xecê tu pi porê min leyîstî, bi serê min ê gurîlokî⁵ kenîyayî?”

2 dûş: şop.

3 ret: westandî.

4 gambaxe: wekî gamêşan gir in, lê ne gamêş in, kûvî ne.

5 gurîlokî: kesê gurî, keçel, şit.

Ferhengok

Ban: Cihê ku li gor derdora xwe piçekî bilind û rast.

Birk: Ji bo kanîyên dorgirtî tê bikaranîn. Cihên avzê tê kolanê yan jî derdora wê tê dîwarkirin û tê çêkirin.

Cirn: Li cihên avzê bo avdana pezî yan jî çêkirina dimsê di şikilê lakêşeyê (çarstê-le) da hatine çêkirin.

Cîm: Navê zevîyên kûr û bijûn in. Ziraeta van zevîyan bibereket e.

Çem: Navê cihên ku dikevin nava du giran "çem" e. Bi piranî avî ne.

Çîq: Navê riwekekê ye ku li ber çeman hemiz şîn dibe. Qayîm e ku jê perde û cimêlik tên çêkirin. Jê ra qamiş jî tê gotin.

Dehl: Cihê ku ji bo darê fêkîyan hatî-ye fetandin. Her cure fêkîyan dihewîne. Derdora dehlan ji bo ku fêkî neyê dizîn yan jî zererê nebînin tê sêncîkirin.

Dêm: Dera bêav. Ji bo dar û berên hewceyîya wan bi avê tune tê bikaranîn.

Dol: Ji bo cihên ku dikevin navbera du giran tê bikaranîn. Ev cih dişibe tîpa 'V' yê yan jî tîpa 'U' yê.

Ger: Di dol û çeman da cihên ku av lê kom dibin, ger in. Ev gerên avê bo avdana ajelan û balavê tên bikaranîn.

Guhor: Cihên ku ji bo karekî hatine terxandin bi vî navî tên naskirin. Mînak; Guhora Conî (conî lê dihat kutan),

Meydanoka-Guhora Keran (Ker xwe lê digevêzin).

Gumîn: Mêrga dewaran e. Tenê gîyayê qutas lê şîn dibe.

Hez: Hezaz. Dera ku axa wê ji ber baranê tehisî.

Hok: Bi du wateyan radibe. Cihên ku rêxa dewaran, zibilê ajelan yan jî zelqa kewan lê hatî komkirin. Sekî, cihê li ber çeman bo çandinîyê hatine fetandin.

Kavil: Wêran. Herifi. Şûnwarên gundên kevn.

Kele: Cihê parastinê. Sûr û dîwarên bajarekî.

Kendal: Tehtên bilind. Nizar. Zinar.

Kîz: Teniştên giran. Alîyên giran yên ji berxwîşkên rengê wan zer, qehweyî û sor in.

Koxik: Cihê heywanên biçûk (qaz, mirîşk, elok, kîvroşk). Lîsa mirîşkan.

Kun: Çal, qul, şikeft. Cihên ku ji hêla baranê ve hatine qewartin.

Kûr: Cihê ku zerengîya wê di bin rûyê erdê da ye. Di toponîmekê da wekî 'kwîr' derbas dibe.

Kûz: Cihên ku erdê wê ne deşt e; wekî çol û çîya ne. Cihên ku ji bo çêreyê guncav in navên wan 'kûz' in. Bi kêrî çandinîyê nayên. Bo sewalxwedîkirinê guncav in.

Lat: Serê kendal û zinaran. Bilindahî,

nihêl, teht.

Lîs: Cihên ku ajelên kedî û kûvî lê kom dibin. Mînak lîsa teyrî, lîsa kurbeşkî.

Mil: Alî, rex, tenişt, kêlek. Ji endamê laşi hatîye wergirtin.

Newal: Robarê biçûk. Nihêl yan jî dolên avê tê da diborin.

Nizar: Pal. Evrazî. Cihên ku tav lê nade.

Pal: Nizar, evrazî. Cihên ku bimeyl in.

Pişt: Ji bo alîyê jor yê gir û milan tê bikaranîn.

Repin: Gîyayên hûr, qutas û gur. Cihên ku ev gîya lê şîn dibe, bi vî navî tên nas-kirin.

Rez: Dehla mêwan. Tenê ji darên dêm (mêw, fisteq, zeytîn, behîv, ben) pêk tê.

Rêbar: Warê çûnehatê, guzergah.

Rû: Robar, çem.

Sîlav: Ava ku ji cihekî bilind (kendal, zinar) dikeve xwarê.

Şikêr: Koma berên li ser hev. Li kenarên dehl û zevîyan tên çêkirin.

Tuy: Peravên çeman yên rast.

Xwêrîz: Cihên ku mî û bizin lê tên xwêdan.

Zivingog: Şikeft. Kuna di tehtê da.

Zînî: Serê gir û milên rast û pehn.

Zîr: Gir, kox. Girê têrber. Girê bilind û ripîrast.

Çavkanîyên nivîskî

Aksan, D. (1969) *Teblîxa bi navê “Uluslararası Adbilim Kurultayı ve Düşündürdükleri*. Vîyana.

Caferoğlu, A. (1965). *Aydın İli Ağızlarından Örnekler Etnografya Bakımından Özellikleri*. TDAY-Belleten. Ankara.

Memedov, N. (1993). *Türkiye’de Halk Ağzından Derleme Sözlüğü*. C. I-XII. Türk Dil Kurumu. Ankara.

Memmedov, N. (1993). *Azerbaycan’ın Yer Adları* (Oronimiya). Bakı.

Murzayev, E. M. (1974). *Oçerki Toponimiki*. Akademîya Nauk SSR İnstitut Geografii. Mîsil. Moskova.

Şahin, İ. (2007). *Türkçe Yer Adlarının Yapısı Üzerine*. Atatürk Üniversitesi Türkîyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi. (32). 1-14. Erzurum.

Yavuz, S. & Şenel, M. (2013). *Yer Adları (Toponim) Terimleri Sözlüğü*. Turkish Studies Dergisi. Cilt 8/8 yaz. Ankara.

Çavkanîyên dijîtal

<http://beta.ferheng.org/search.php?lang=ens-titu&query=p%C3%Pirik>

<https://play.google.com/store/apps/details?id=com.wqferheng&hl=tr>

Kesên çavkanî

Hecî Simailê Fêrigî:

(Nevîyê Hecî Ehmedê Fêrigî ye), 71, cotkar.

Mamê Aqwîb:

(Nevîyê Hecî Ehmedê Fêrigî ye), 70, cotkar.

Mihemê Heso: 88, nêçîrvan.